


## Mistefa Hicrî derheq koça dawiyê ya Mam Celal peyameke sersaxiyê belav kir

»»» R:3




*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (311) 07-10-2017 Buha (1000) Tûmen*




## PDKÎ: Em sersaxiyê li gelê xwe û bi taybetî li Kurdistana Îraqê dikin

»»» Dom R:3

## Girtiyê siyasî tuneye

»»» Dom R:2



# Kîna Tehranê ji dewleta Kurdistanê




»»» Nûçeya manşêtê li R:4

## Rejîma Îranê dev ji gefxwarinê ber nade



**Nûçegihaniyên rejîma Îranê roja 13ê Rezberê ji zarê pasdarê terorîst Mihemed Husên Baqirî serokê Navenda Giştî ya Hêzên Çekdar ên rejîma Îranê ve belav kir ku hekî pirsa serxwebûnê nehê çareserkirin, ew yek wê bibe sedema pêkhatina aloziyan di herêmê de.**

Wî berpirsê terorîst ê rejîma Îranê bas ji vê kiriye ku pirsa serbixweyiyê pirsek nebû ku niha bas jê bihê kirin, xelkê Başûra Kurdistanê çima serxwebûnê dixwazin? Ma wan niha çi tiştek kêm heye?

Navbirî herwisa bas ji vê kiriye ku referandoma serxwebûna kurdistanê leyîza bi hesta xelkê bûye, û herwisa tu çavdêriyek li ser vê referandomê nebûye, û pêştir bixwe encama vê referandomê %94 ragehandibûn.

Çend rojan berî niha Erdoxan serdana Îranê kiribû, û digel Xamineyî û Rûhanî rûniştibû, û hevdîtin kiribû, û derheq pirsa serxwebûna Kurdistanê helwest girtibû. Xamineyî di civîna xwe ya digel Erdoxan sedema referandoma serxwebûna Kurdistanê û piroseyê, vegerande bo pirojeya Amerîkayê û ragehandibû: Amerîka û hêzên din ên bîhanî ji riya piştevanîkirina referandoma Kurdistanê pilanan dadirêjin bona avakirina Îsraîleke nû di navçeyê de.

Xamineyî bas ji vê yekê jî kiriye ku pêwîst e li ser Îran û Tirkiyê, rêûşûnên hewce li dijî cudabûna Kurdistanê bigrin pêşiya xwe. Serbarê nerazîbûnên herêmî û navdewletî Herêma Kurdistanê roja 3ê Rezberê referandoma serxwebînê encam da, û %92 ji xelkê Kurdistanê dengê Belê dane serxwebûna Kurdistanê.

Serbarê hemû gef û helwestan, Hikûmeta Herêma Kurdistanê li ser biryara xwe pêdagir e, û bas ji gotûbêja piştî encamdayîna referandomê dike.

## Sergotar

# Girtiyê siyasî tuneye

N: Kerîm Perwîzî

Di welatekî jêr deshilata dîktatorî û faşîzmê de, tiştek bi navê girtiyê siyasî nikare watayek hebe, û îşare bi tiştekî rasteqîne nabe. Di rastî de têgeha girtiyê siyasî dikare çemk û têgeheke çewtekarane û bona ji rê derxistinê be.

Girtîgeh li gora wateya xwe, û wê wêneya ku di dêna takekesan de ava dike, cihek e ku takên serberedayî û yên ku ji norm û nirxên civakî ba didin (la didin), yan jî yên ku çarçoveya jiyana bihevrebûnê di civakekê de dixin bin piyan, tê de têne ragirtin, û ew der dibe cihek, ku kesên serberedayî û dijberî yasayê ceza dike, û hem jî hukmê yasyaê bicih dike.

Di vê karê giştî ê girtîgehê de, êdî her sîstemeke demokratîk û nîve demokratîk û nademokratîk li gora berjewendî û akarên xwe mifahê werdigrin, û yasayên cuda şêwaza mifahwergirtina ji girtîgehê di sîstemên cuda de destnîşan dikin.

Di rejîmeke faşîstî wekî Komara Îslamî de, faşîzma dasepandî û peyrewkirî, hemû kunceke jiyanê dagîr dike, û her tiştî dike hêla siyasî. Di rastî de li jêr deshilateke faşîstî de, êdî siyaset tenê pêk nahê ji biyavên giştî ku tê de deshilata hikûmetê û dewletê destnîşan dikin. Belkû deshilat û hukmkirin û siyaset serûbinê civakê bi xwe ve digre, û heya di rengê cilûberg û şêwaza kinc lixwekirinê, û heya nan û av vexwarinê de jî reng dide.

Di bin hukmê faşîzmê de, hemû kiryarek dibe siyasî, jiber ku ferman ji bo her tiştî heye, û xelk jî ji hemû tiştên sade û aloz bo dijberiya fermanên wê mifahê werdigrin .

Ji aliyekî din ve, deshilatdariya dasepandî di Îranê de, taybetmendiyeke din heye, ku di sîstemên faşîstî ên din de wê cudatir dike, ew jî bê exlaqî ye li hemberî hemû normên civak û cîhanê, û ji bilî zimanê zor û çeqoyê, çi zimaneke din nas nakin. Li gora vê yekê taybetmendiya rejîmeke şarlatan tê de zeq dibe. Di sîstema Komara Îslamî de hikûmeta faşîstî hemû sînoran dibezîne, û dibe hikûmeta şarlatanan, û di sîstemeke weha de, êdî girtîgehê tu watayeke wê nine, belkû yên ku destbiser dikin, di rastî de wekî rehîn digrin, ku şarlatan di hemberî berdana wan de pere werdigrin.

Bi vê pêkê di Komara Îslamî de, hemû tişt dibe mijara siyasetê, û hikûmet ji rê û şêwazên şarlataniyê bona sepandina hukmên xwe mifahê wergire, û Kurdbûn bixwe ew qasê siyasetê ye di Îranê de!.



Di vir de ye ku em bi başî tê digihîjin, ku çima Komara Îslamî di bûyereke asayî de wekî eyankirina kêfxweşiya xelkê Kurdistana Rojhilat, bi sedan kesî wekî rehîn digre, û dibêje malbatên wan, ku dibe hûn gireveke sed milyon Tûmenî danên, da ku em ezîzên we berdin!

Di bin deshilata hikûmeteke faşîstî ya şarlatanî de, girtî tu watayeke wî/ê nine, da ku cureya wê ya siyasî hebe!. Belkû her wekî di kiryarê de jî selimandine, ew xelkê wekî rehîn (girûgan, barimte) digrin, da ku bi pere azad bikin!. Ew girtiyê siyasî nînin, belkû rehîn in di destê şarlatanan de.

# Partiya Azadî ya Kurdistanê-Bakûr serdana PDKÎ




**Heyeteke Partiya Azadî ya Kurdistanê- Bakûr serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kir, û derheqê rewşa Kurdistan û referandoma serbixweyiya Kurdistanê gotûbêj kirin.**

Di roja Yekşemî 1`ê Çiriya Pêşîn a 2017`an de, şandeke Partiya Azadî ya Kurdistanê- Bakûr, bi serperastiya “Mistefa Ozçlîk” serokê vê Partiyê, serdana Deftera Siyasî a PDKÎ kir û ji aliyê “Mistefa Hicî” sekreterê giştî yê Partiya Demokrat û hejmarek ji endamên Deftera Siyasî û Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat ve pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê civînê de “Mistefa Ozçilîk” bas ji vê yekê kir ku, serdana me bi armanca pirsa referandoma Başûrê Kurdistanê, û herwiha axavtinek derheqê rewşa Başûrê Kurdistanê, pêwendî digel pirsa referandoma serbixweyiya Kurdistanê ye.


Ozçelîk herwiha bas ji vê yekê kir ku, me û Partiya Sosyalîsta Bakûr û Partiya Demokrata Bakûr komek civîn derheqê piştevanîkirin ji referandoma Başûrê Kurdistanê pêk anîne, û herwiha kesayetiyên siyasê yên kurd û hindek Parlimanter û rojnamenivîs û berpirsên hikûmî ji vê piroseyê piştevanî kirine, û digel vê ku şerê xendeqan bandore nerênî li ser beşek ji xelkê hebûye, lê dîsan jî bi giştî raya giştî a Kurd digel referandomê bûye, û herwiha Ozçelîk got ku, rola xelkê Rojhilata Kurdistanê, gellek baş û piştevanekî girîng, û bivêrane bûye.

Di pêwendî digel rewşa Îranê, helwêsta aliyên siyasî yên Rojhilata Kurdistanê û pêşwaziya komên xelkê Kurdistanê, Mistefas Hicrî axavtinek pêşkêş kir, û bas ji vê yekê kir ku tevî neyartiya eşkere a rejîma Îslamî a Îran, digel pirsa referandomê, xelkê Rojhilata Kurdistanê bivêrane hatine bo ser şeqaman û piştewaniya xwe ji piroseya referandoma serbixweiya Kurdistana Başûr nîşan dan, û herwiha bi kiriyar nîşan dan ku givaşên rejîma Îslamî a Îranê û pîlanên neyarên Kurd nikarin pêş ji karwanên xebata gelê me bigirin.

Herwiha Hicrî got ku: Pirsa referandomê di gellek waran de xala erînî hebûye, û yek îradeyî û yek gotarbûna Kurd nîşana civaka cîhanê da.

Di dawiya vê axavtinê de, sekreterê giştî yê PDKÎ, bersiva pirsiyarên ku pêwendî digel vê basê hebûn, û ji aliyê hevalên Partiya Azadî ya Kurdistanê- Bakûr ve hatibûne pirskirin, da.

## Mistefa Hicrî derheq koça dawiyê ya Mam Celal peyameke sersaxiyê belav kir



**Mistefa Hicrî sekreterê giştî ê PDKÎ di peyamekê de sersaxî li gelê Kurd, serkirdayetiya YNK`ê û malbata Mam Celal kir.**

**Deqa peyamê:**

Endamên malbata Mam Celal Talebanî!

Mam Celal piştî temenek ji xebata li dijî binpêkirina mafê Kurd, û xebat bo rizgariya neteweya xwe mixabin koça dawiyê kir.
Kesayetiya bilind ya Mam Celal di biyavê siyasî û pêşmergatiyê, û ew ezmûna zaf ya ku di vê biyavê de bi dest xistibû, her hemû jî sedema amadekirina wê rewşa bibandor bûn, ku di xebata li dijî dijminên gelê wî de, ew rêzdar kiribûn xebatkar û siyasiyekî serkevtî û xûya yê doza Kurd û asta navneteweyî.
Lewra jidestdayîna Mam Celal bi taybetî di vê rewşa hestiyar ya xebata Kurd di Başûr de, xisareke mezin bû, bo PDKÎ jî, jidestçûna dostekî emegdar û mêjîn bû, ku di serdema şehîd Dr. Qasimlo de ew dostayetî bingeha wê hate avakirin, û berdewam bû.

Bi boneya vê bûyera pirr matem û dilêş, ez sersaxiyê dibêjme gelê Kurd, serkirdayetî û rîzên YNK`ê û bi taybetî malbata wî, birêzan Hêro Îbrahîm Ehmed a hevjîna wî, û kurên wî Pavil û Kak Qubad.

**PDKÎ**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**

**12.07.1396**
**04.10.2017**

## PDKÎ: Em sersaxiyê li gelê xwe û bi taybetî li Kurdistana Îraqê dikin



**Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya koça dawiyê ya Mam Celal peyameke pirse û sersaxiyê belav kir.**

**Deqa peyamê:**

Jidestdana Mam Celal xemeke sertaserî ye

Hevwelatiyên birêz!
Xebatkarên Kurd!
Hezkerên YNK`ê!

Mixabin roja 11`ê Rezbera 1396`an a Rojî, 3`ê Octobera 2017`an a Zayînî, Kurdistanê kesayetiyekî mezin ji dest da, ku zêdetir ji nîv sedsalî ji jiyana xwe, di pêxema rizgariya gel û nîştiman û bexteweriya xelkê de derbaz kir.

Birêz Mam Celal Talebanî, Mam Celalê têkoşerê Kurd, herçend di gundekî Kurdistanê de, li quntara çiyayekî de ji dayîk bû, lê xebat û têkoşan û hewlên berdewam ên navbirî di pêxema nîştiman û xelkê de, ew kirin kesayetiyekî Kurdistanî û navçeyî û cîhanî.

Birêz Mam Celal sekreterê hizbeke şoreşger û xebatkar bû, ku di qonaxên dijwar ên jiyana Kurdistana Îraqê de ew hizb ava kir, û wê hizbê çendîn qonaxên girîng û hestiyar ên dîrokî derbaz kirin.

Mixabin nexweşiyê Mam Celal ji cîhana siyaseta Kurdistanê dûr xist, û valahiyeke berçav di rîza siyaset û xebata di Kurdistana Îraqê de pêk anî, û jidestdayîna vî kesayetiyê mezin zirareke mezin gehande cendekê xebat û siyasetê li Kurdistana Îraqê, û hizba wî ya têkoşer, ku tenê bi hevahengî û tebahî û pêkvebûnê cihê wê xisarê dikare bê tejîkirin.

Mam Celal dostekî giranqedir ê PDKÎ û xebata li Kurdistana Rojhilat de û hevpeymanê Dr. Qasimlo û PDKÎ bû, ku jidestdayîna vî kesaytiyê bo yên mezin jî dikelîne. Em di PDKÎ de tevî sersaxîkirina li kesûkar û mal-û kurên wî, em hevxemê Mekteba Siyasî û serkirdayetî û hemû endamên xwe, bi taybetî di Kurdistana Îraqê de.

bû, û di rojên dijwar û bizehmet de, dost PDKÎ jî kovaneke mezin e, ku birînên me bata birêz a Mma Celal, bi taybetî hevjîn YNK`ê ne. Em sersaxiyê dibêjne gelê

Em tevî eyankirina xem û kovana xwe bona jidestdana vî kesayteiyê ser hevahengî û tebahî û pêkvebûnê, çi di nava refên wê hizba dostê me

mezin, cardin em pêdagiriyê dikin li YNK`ê, û çi jî di nava hemû hizb û aliyên siyasî û xebatkar ên Kurdistana Îraqê de, ku ew qonaxa hestiyar ya dîroka vê para nîştimana me, di bin xemeke weha mezin de, tenê bi pêkvebûnê dikare bigihîje serkevtinên mezin.

**Riha Mam Celal şa be**

**Sebr û xweragirî bo ezîzên wî**

**Tebahî û serkevtin bo xebat û tekoşîna di Kurdistanê de**

**PDKÎ**
**Deftera Siyasî**

**12.07. 1396**
**04.10.2017**

# PDK Îranê: Rejîma Îranê heyfa şikestên siyasî ên xwe ji xelkê sivîl distîne




**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di daxuyaniyekê de destbiserkirina bi kom ya xelkê Rojhilatê û mîlîtarîzekirina Kurdistanê mehkûm û şermezar kir û daxwazê ji kom û civatên siyasî û nawendên cîhanî ên têkildar dike ku givaşan bixin ser rejîma Îranê daku çiqas zû ye, girtiyan serbest berde û bajarên Kurdistana Rojhilatê jî, ji hêzên leşkirî ên xwe vala bike.**

Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:

“Rejîm bersiva şahî û keyfxweşiya xelkê bi mîlîtarîzekirina bajaran dide”.

Hevwelatiyên birêz!

Kom û civatên cîhanî ên mirovdost

Roja 25’ê Îlona 2017’an (3’ê Rezbera 1396’an), piştî birêveçûna refrandoma diyarkirina çarenivîsa neteweya Kurd li Kurdistana Başûr de, xelkê Kurdistana Rojhilatê jî bi nîşaneya hevpeywendiya neteweyî û nîşandana hevsoziya xwe, bi awayek aştiyane û medenî, derketin ser qadan û li civîn û civatên dehan hezar kesî de, şadî û keyfxweşiya xwe derheq vê roja dîrokî nîşan dan. Rojek dîrokî ku têde hevziman û hevneteweya wan li beşek din ya Kurdistanê de ji riyek demokratîk û aştiyane bi mekanîzma rapirsiyek aram, dengê xwe li ser çarenivîsa xwe dan û pêka encamê jî, bi piraniyek berbiçav, anku %92.73 dengê xwe ji serxwebûnê re avêtin.

Komara Îslamî ku midehekî zaf e hêz û cebilxaneyek zaf bo bajarên sînorî ên Rojhilatê aniye û bi gef û gurran ve dijberiya xwe bi birêveçûna refrandomê li başûr de nîşan dide û vê yekê jî bi alîkar bo xurtkirina alozî û dubendiyên zêdetir li deverê de dizane, li hember xweşî û şahiya aram û medenî ya xelkê Rojhilatê de ecêbgirtî ma, lewma dest bi fitne û afirandina dubendî û kiryarên hovanetir ji terorîstî kir.

Take guneh û tawana xelkê Rojhilatê, eva bû ku bi nîşaneya xweşî û hevsoziya bi hevziman û hevneteweya xwe di aliyê din ên sînorê sepandî de, şahiyek medenî kirin û berevajî Komara Îslamî ku gef ji birêveçûna wê refrandomê dixwar, xelkê Rojhilatê bi pêşwaziya wê çûn û hemû gef û kompiloyên rejîma Îslamî ya Îranê bulqa ser avê kirin, lewre Sipaha Pastaran û dezgehên sîxorî ên rejîmê ketne heyfstandin û tolhildana ji xelkê.

Li çend rojên derbasbûyî, li gelek bajarên Kurdistana Îranê de bi sedan kes ji xelkê asayî ji aliyê dem û dezgehên îtilaatî û tepeserkar ên rejîmê ve hatine destbiserkirin û tu agahî ji çarenivîsa wan nine. Di van rojên dawiyê de, hêzek zaf ya pastaran bi çek û teqemeniyên giran ve bo nav bajarên Kurdistana Rojhilatê hatine veguhastin ku tenê li şerê du arteşên bihêz de ew çek û teqemenî tên bikar birin, nek ji bo tepeserkirina xelkê sivîl.

Komara Îslamî carek din selimand ku hemû gef û gurrên derekî ên wê, vala û bêbingeh in, û tenê şiyan û karîna serkut û tepeserkirina xelkê sivîl û medenî heye, û heyf û tola şikestên siyasî ên xwe, ji xelkê asayî û sivîl vedike.

Ew şahî û keyfxweşiya xelkê bajarên Kurdistana Îranê, da selimandin ku berevajî siyasetên qirêj û nemirovane ên rejîmê, neteweya Kurd agah û hişyar e û li hember çewaşekariyên Komara Îslamî de bi çok de nahê.

Em tevî mehkûm û şermezarkirina van kiriyarên hovane ên Komara Îslamî, daxwaz dikin ku çiqas zû ye, girtî û destbiseran azad û serbest bike û hemû ew hêzên leşkirî ên xwe bo derweyî bajarên Kurdistanê û cihên ku jê anîne, veguhêze.

Em daxwaz ji kom û civatên siyasî û nawendên cîhanî dikin ku givaşê ji Komara Îslamî re bînin daku çiqas zû ye girtî û destbiseran, serbest berde û bajarên Kurdistana Rojhilatê jî ji hêzên leşkirî vala bike.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**

**28’ê Îlona 2017’an**
**6’ê Rezbera 1396’an**

**»»» Nûçeya manşêtê**

**Elî Xamineyî di dawî axavtinên xwe de, li dijî referandoma Kurdistanê, di dema hevdîtina bi Erdoxan re ragehand: “Amerîka û hêzên din ên biyanî ji riya referandomê ve, bona avakirina Îsraîleke din di navçeyê de hewl didin”.**

Wekî rênîşandan û şîretekê jî bo kirêgirtî û per û baskên xwe yên têker di Îranê de ragehandibû: “Pêwîst e ku rêşûnên taybet û bilez, li dijî veqetiyana Kurdistanê bigrin pêşiya xwe”.

Piştî birêveçûna referandomê, hêzên rejîma Îranê û hêzên Îraqî bona birêvebirina manoreke leşkerî ya hevbeş li ser sînorên Kurdistana Rojhilat cihgir bûn, hevdem cuda ji zalkirina rewş û hewayê leşkerî û polîsî bi ser beşa herî zêde ji bajarên Rojhilata kurdistanê gellek çekên giran jî, li bajarên sînorî de cihgir kirin.



Rejîma Îranê di rastî de leyîzeke metirsîdar dike, ku ew jî ew e ku bixwe rasterast şer nake, belkû ji riya ekter û lîstikvanên din ên navçeyî armancên xwe dipêke, lê jiber ku qada leyîzê Kurdistan e, bêguman her wekî şirovekar dibêjin, ew nikarin serkevin, û wê rastî şikestê werin.

Piştî gotinên bê serûber ên Xamineyî, pasdarê terorîst Mihemed Husên Baqirî serokê Navenda Giştî ya Hêzên çekdar ên rejîmê basê vê kir ku, hekî pirsa serxwebûnê nehê çareserkirin, wate encama referandomê nehê hiloşandin, navçe wê rastî aloziyan bê.

Pêş axavtina vî pasdarê terorîst Elî

**»»» Dom R: 8**

# Raport/Referandoma serxwebûna Kurdistanê bi dawî hat

**Dengdana bo serxwebûna Herêma Kurdistanê piştî beşdariya berçav ya xelkê Kurdistanê bi awayekî serkevtî bi dawî hat.**

Destpêka referandomê

Roja Duşemiyê 3`ê Rezbera 1396`an, xelkê Başûra Kurdistanê, di piroseyeke dîrokî û çarenûssaz de, çûne ser sindûqên dengdanê, û çarenûsa xwe diyarî kirin.

Referandoma serxwebûna Kurdistanê li navçeyên jêr deshilata îdareya Herêma Kurdistanê, û tewahiya navçeyên Kurdistanî ku di bin kontrola hêza Pêşmerge ya Kurdistanê de ne, bi rê ve çû.

Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê ya Herêma Kurdistanê belav kir, ku zêdetir ji 5 milyon kesî dikarin di piroseyê de beşdariyê bikin, û li sertaserî Başûra Kurdistanê, 12 hezar binke hatine danîn, ku 7 hezar di parêzgehên Herêma Kurdistanê de ne, û 5 hezar jî di navçeyên Kurdistanî ên derveyî îdareya Herêma Kurdistanê de hatibûn danîn.

Encama nefermî ya dengdanê

Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê ya Herêma Kurdistanê di kongireyeke rojnamevanî de, encama destpêkî ya referandomê weha ragehand:
-3 milyon û 985 hezar û 120 kesî mafê dengdanê hebûye li sînorê Herêma Kurdistanê, û wan navçeyên di bin deshilata pêşmerge de ne, ku carê li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê de ne.

-Hejmareke zaf ji Kurdistaniyên derveyî navçeyên îdareya Herêma Kurdistanê tomara dengdanê tunebûn, û di nava kempan û nava bajarên herêmê de akincî bûn, lê karîn deng bidin ku hejmara wan 497 hezar û 190 dengder bûne.

-Dengderên derveyî welat, tomara fermî di ber destên wan de tunebûye, û 98 hezar û 945 dengder bûne.

-Li gora wan datayên serve, 4 milyon û 581 hezar û 255 kesî mafê dengdanê hebûye.

-Hejmara beşdarên piroseyê 3 milyon û 305 hezar û 925 kes bûne, ku dike %72.61.



Komîsyona Bilind ya Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsiyê ya Herêma Kurdistanê ragehandiye ku ewê hewl bidin di heyama kêmtir ji 72 demjimêran de encamên fermî ragehînin.

Dawiya Referandomê

Piştî bidawîhatina referandomê, li bajar û bajarokên Kurdistanê de, hevwelatiyên Kurdistanê bi awayên cur bi cur dest bi govend û dîlanê û kêfxweşiyê kirin.

Di nava wan govend û dîlan û kêfxweşiya Kurdan de, pêkhateyên din jî beşdarî kirin.

Herwisa hejmarek ji Kurdên Îsraîlê, hevdem digel birêveçûna referandomê, li pêşberî konsolxaneya Amerîka li Urşelîmê kom bûn, û piştgiriya xwe ji referandomê nîşan dan.

Helwesta Kurdistana Rojhilat, derheq referandomê

Piştî ragehandina roja referandomê, hevwelatiyên Kurdistana Rojhilat bi her awayekî ku ji dest wan hat, piştevaniya xwe ji referandomê nîşan dan.

PDKÎ di du daxuyaniyan de, piştevaniya xwe ji serxwebûna Kurdsiatanê ragehand û daxwaz ji xelkê kurdistanê kir, ku piştevaniya serxwebûnê bikin.

Komîsyona Teşkîlatê ya PDKî herwisa daxwaz ji xelkê Kurdistanê kir, ku piştevaniyê ji serxwebûnê bikin, û çalakiyên curbicur bi rê ve bibin.

Herwisa PDKÎ karnevalek bo piştevaniya ji serxwebûna Kurdistanê bi rê ve bir

Di vê derheqê de endam û alîgirên PDKÎ di Rojhilata Kurdistanê de çalakiyên teblîxî ên girîng bi rê ve birin, û gelelk diruşm di vê derheqê de li ser der û dîwaran nivîsandin, û alaya Kurdistanê li gellek ciyan bilind kirin, li gellek ciyan jî dîwar bi alaya Kurdistanê xemilandin.

Herwisa di roja referandomê de, serbarê rewşa tund ya ewlehiyê û milîtarîzekirina Kurdistanê, Kurdistaniyan li piraniya bajarên Kurdistana Rojhilat, kincên bixeml ên kurdî li xwe kirin, û şîrînî di nava xelkê de belav kirin, û bi dengeke bilind stran û sirûdên şoreşgerî di şeqaman de belav kirin.
Xelkê welatparêz ê Rojhilata kurdistanê, li ser qadan û kolanên serekî ên çendîn bajarên Kurdistanê, bi diruşma Azadî Azadî, pîroz e pîroz e, serxwebûna Kurdistanê pîroz e, Pêşewa! alaya te hate bilindkirin, hêzên rejîmê rastî heyrîmanê kirin, û li çendîn bajarên kurdistanê de jî, ku tê de çendîn hezar kes beşdar bûn, xelkê sirûda neteweyî ya Ey Reqîb digotin, û li hinek ciyan de jî li ser bilindahiyan agir hilkirin.

Herwisa ciwanên şoreşger li Tengîserê, li roja referandomê de, serdana tirba şehîdan kirin, û peymana wefadariya bi rêbaza wan nû kirin.

Helwesta hikûmeta Îraqê:

Li gel birêveçûna pirosesa refrandoma serxwebûna Kurdistanê, li Civata Nûnerên Îraqê de çend biryar li dijî kurdan hatin derkirin. Ew biryar ku bi bêy beşdariya Kurdan hatine derkirin, serokwezîrê Îraqê hatiye erkdarkirin ku hêza leşkirî li dijî kurdan di deverên sînorê madeya 140 de bi kar bîne.

Herweha di Parlementoyê de biryar hatiye dayîn ku di dadgeha Federaliya Îraqê de doze li dijî Serkomarê Îraqê bê vekirin û bi tometa pêpeskirina xala 61 a destûra Îraqê ya taybet bi serweriya Îraqê, Fuad Meisûm ji kar bê dûrxistin.

Heyder E`baDî GEF JI Kurdistana Başûr xwar ku dê êrîşa leşkirî bike ser Kurdistanê.

Serbarê wê ku Civaka navnetewî û welatên cîranê Kurdistanê, ji riya çend pêşniyaz û pirojeyan ve hewil dan ku biryara encamdayîna referandomê bê hiloşandin yan bê paşxistin û kurd vegerin Bexdayê û guftigoyê dest pê bikin, lê rêberiya siyasî ya kurd nepejirand û cehd û tekoşîna han rastî şikestê hat.

Helwesta welatên biyanî

``Îmanoêl Makron`` serkomarê nûhilbijartî yê Firansayê jî di prês konferansekê di civîna rêberên cîhanê li

## Hewlên rejîmê bûne bilqa ser avê

**Piştî vê ku navendên ewlehî û leşkerî ên rejîma Îranê li bajarên Kurdistana Rojhilat hewl dan ku bi birina hêza leşkerî û heta birina tankan bo nav wan herêman, xelkê çavtirsandî bikin, lê xelk rijiyane ser şeqaman û bersiveke tund dane rejîmê.**

Li gora nûçeya ku gihaye malpera Kurdistanmedia, serbarê gefxwarinên berdewam bona tirsandina ciwanên Kurd li Kurdistana Îranê, ji aliyê hêzên dijîgelî ve, ciwanên xwîngerm ên Kurdistanê hewlên rejîma Îranê kirin bilqa ser avê, û tevî lixwekirina kincên bixeml ên Kurdî, pîrozbahî li hevûdin dikirin, û şîrînî di nava xelkê de belav dikirin.

Li gora nûçeyan, xelk li bajarê Banê bi rêkxistina govend û dîlanê û bilindkirina alaya Kurdistanê û xwendina sirûda neteweyî ya Ey Reqîb rewşeke pirrcoş afirandin, ku bû sedema heyrîmana hêzên rejîmê.

Herwisa li bajarê Seqizê ciwanan bi belavkirina nuql û şîrîniyan û belavkirina sirûdên şoreşgerî û stranên kêfxweşiyê kêfxweşiya xwe derheq referandomê eşkere kirin.

Li bajarê Merîwanê jî, xelkê welatparêz ê vî bajarî rijiyane ser şeqaman, û bi gotina sirûdên nîştimanî bersiva şandina tank û topên rejîmê dan.




Meydana Îqbal ya bajarê Sinê jî, şahidê destanrêsiyeke jibîrnekirî ya ciwanên şoreşger ên Kurd bû, ku hemû hewlên rejîmê pûç kirin.

Bi giştî lawên Kurd selimandin ku çek û cebilxane û mîlîtarîzekirin nikare îradeya gel bixe qedeman.

## Roja emeliyata Nobarê hate bîranîn

**Bi boneya bibîranîna roja emeliyata "Nobar" a li hemberî tarîperestên rejîma Îranê, di bajarê Bokanê de, çalakiyên tebilîxî hatin lidarxisitin.**

Li gora nûçeya gihîştî bi malpera Kurdistanmedia, endam û alîgirên PDKÎ bi boneya emeliyata qeremanane a hêzên pêşmerge yên kurdistanê, li bajarê Bokanê û bi girtina binkeya leşkerî a "Nobar" a ser bi bajarê Bokanê, çalakiyên tebilîxî bi rê ve birin.

Di vê çalakiya tebilîxî de, qehremanên Demokratê di roj Înê 7`ê Rezbera 1396`an de, li ser girê gundê Hebasava ya di navbera girê Qebran, Enbara xarê û Daşbend, bi boneya bîranîna, emeliyata Nobarê, alayeke mezin a Kurdistanê hildan.

Di emeliyata Nobarê de, pêşmergên PDKÎ di şer û pevçûnekî qehremanane de, karîn ku binkeyeke leşkerî a Nobarê bixin jêr kontrola xwe de, û hêzên dagîrker yên dijimin şikest bidin.



»»» R:6

Civata giştî ya rêkxistina NY de lid or encamdana referandoma serxwebûna Kurdistanê ragihandibû ku Firansa tu astengiyekê dernaxîne û welatê wî bi kurdên başûra Kurdistanê re têkiliyek dîrokî heye.

Binyamîn Natanyaho, serokwezîrê Îsraîlê jî bi eşkere ragihand ku: ``Kurd, neteweyek xebatkar in û hêjayî wê ne ku bi xwe çarenivîsa xwe diyarî bikin``.

Herweha çendîn welatên din ên Rojavayî jî piştevaniya xwe mafê çarenivîsa gelê Kurd nîşan dan.

Sitêvan Doyarîk, berdevkê sekreterê Giştî yê NY jî derheq refrandoma Kurdistana Başûr da zanîn ku, hewce ye pirsgirêk bi diyalogê werin çareserkirin.

NY herweha da xuya kirin ku emê kar û xebatên xwe li Herêma Kurdistanê de bidomînin.

Sara Senderz, berdevka Koşka Sipî jî di bersiva reaksiyon û karvedanên Tirkiye û rejîma Îranê lid or referandoma serxwebûna Kurdistanê de, da zanîn ku, em hêvî dikin ku Îraq ji bona şikandina Daiş`ê de hevgirtî bimîne. Serokwezîrê Kanada ``Cestên Tirodo`` jî ragihand ku, em rêz ji piroseya refrandoma kurdan digrin.

``Hêzer Niwêrt`` ê berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê jî daxuyaniyek weşand û da zanîn ku: Encamdana referandomê, tu bandorek nerênî li ser têkiliyên navbera Amerîka û Herêma Kurdistanê nake û pêwendiyên dîrokî ên me dê bidom in.

Rejîma Îranê û helwestên vala ên wê

Piraniya rojname û medyayên rejîma Îranê bi awayek rijd êrîşî herêma Kurdistanê û piroseya refrandoma wê kirin û hewla bi neyasayî nasandina wê dan.

Rojnameyên wek ``Cewan, Cimhorî Islamî, Xurasan, Kêyhan, Hemdilî, Siyaset rûz, Ebrar, Efkar, Yezd, Hemşehrî, Aftab`` û çendîn rojname û belavok û medyayên din ên rejîmê bi xirabî û sivik qala refrandoma serxwebûna Kurdistanê dikirin.

Rejîmên Îran û Tirkiye jib o dijberîkirina bi refrandoma serxwebûna Kurdistanê dest bi mîlîtarîzekirina zêdetir ya bajarên Kurdistanê kirin û çek û locestîkên leşkirî yên zêde ji bo Kurdistanê şandin.

Herweha rejîma Îranê bona çavtirsandina xelkê, caş û çekdarên xwe li jêr navê ``hêza taybet``de di nav bajaran de belav kirin.

Serbarê ew hemû dijberî û astengiyan jî, lê xelkê Başûra Kurdistanê di pirosesek dîrokî û çarenivîssaz de rû ji sindoqên dengdanê kirin û piştî sedsalan bi xwe çarenivîsa xwe diyarî kirin û kurdên her çar parçeyên Kurdistanê jî piştevaniya serxwebûna Kurdistanê kirin û ``NA`` bi dujmin û neyarên kurd re gotin.


## Nerîna Lîderan



Potîn: "Di berjewendiya tu kesî de nine ku pêwendiya aborî bi Kurdistanê re bibire"!.



Xamineyî: "Amerîka û welatên zilhêz dixwazin Îsraîleke din di herêmê de ava bikin."



Erdoxan: "Cîranên Îraqê bi tu awayî nikarin avakirina dewleteke serbixwe div ê herêmê de qebûl bikin."



Mesrûr Barzanî: "Helwesta me derheq encama referandomê nayê guhertin".

# Bezandina sînorên Kurdistana Başûr bê bersiv nabe

**Hêmin Hewramî di hevdîtineke televîzyonî de, bi tundî bersiva gefên Îranê bo ser xaka Herêma Kurdistanê da.**

Roja Şemiyê 9`ê Rezberê Hêmin Hewramî berpirsê karûbarê siyasî û pêwendiyên giştî ên mekteba Mes`ûd Barzanî di hevdîtineke televîzyonî de, bas ji birêveçûna referandomê kir, ku pêngaveke dîrokî ya gelê Kurd e, û ew yek wekî pêngaveke sedsale ya gelê Kurd e.

Hêmin Hewramî derheq manovrên Îran, Tirkiye, û Îraqê ku biryrar e li ser sînorên destçêkirî ên vî welatî bi rê ve here got: Îran û Îraq û Tirkiye di nava welatên xwe de, manovran bidin, eva keyfa xwe ne, lê hekî tenê bihostekê jî bêne nava xaka Herêma Kurdistanê de, eva bêbersiv namînin, emê canê xwe bidin, lê em nahêlin ku îradeya xelkê me bişkê, jiber ku ya ku tê kirin, bo şikandina îradeya paş referandomê ye.

Herwisa derheq gefên Îran û Tirkiyê, derheq daxistina sînoran û bidawîanîna pêwendiyên bazerganî ên vî welatî digel Herêma Kurdistanê, îşare bi vê kir ku yekem car ew welat bixwe zirarê dibînin, jiber ku beşa herî zêde ya kelûpelên rejîma Îranê û Tirkiyê, li bazarên herêma kurdistanê têne firotin, û got: Me bi dirêjahiya 25 salên borî selimandiye ku Herêma Kurditanê faktera sereke ya seqamgîriya Îran û Tirkiyê ye, emê li ser pêwendiyên xwe berdewam bin, û emê rêz ji cînaran bigrin, em hêvîdar in ku Tirkiye û Îran jî wisa bin.



Herwisa navbirî got: Serdema peymannameyên Bexda, Se`idabad, Lozan, û Elcezayirê derbaz bûye, ku bikarin bi wajoyekê yan lihevkirinekê biryara têdeçûna gelê Kurd bidin.

Di dawiya axavtina xwe de, Hêmin Hewramî bas ji vê kir ku hekî Kurdistana Başûr nesaqamgîr be, seqangîrî û aramiya rejîma Îranê û Tirkiyê jî têk diçe.

# Komara Îslamî li dijî Kurdistanê, Heşda Şe`ibî tûj dike

**Beşek ji milîşên ser bi rejîma Tehranê gefên êrîşkirina bo ser Herêma Kurdsitanê dixwin.**



Malpera El-Erebiya di nûçeyekê de eşkere kiriye ku; "Qeys El-xez`elî" serkirdерê girûpa "Esa`ibê Ehlê heq" a ser bi Heşda Şe`ibî dirustkiriyê destê rejîma Tehranê di yekem dijayetiya li hember referandom a serxwebûna Başûrê Kurdistanê gefên şer li dijî kurdistanê kiriye.

Li gora vê raporê Xez`elî di rêkewta 30`ê Tebaxê de, di rêûresmeke matemenî li bajarê Necefê de gotiye ku: Em dikarin wan deverên ku Herêma Kurdsitanê dagîr kirine di heyama mehekê de werbigirin.

Herwiha navbirî gotiye ku: Dibe hemû çalên neftê û rêrevên di destê Herêma Kurdistanê de ne, ji wan werbirgirin, û bi zorê li hember wan çekê bi kar bînin; û ev kesên ku daxwaza cudabûnê dikin, dibe ku ji nav bibin.

Herwiha gotiye ku ev giştpirsiya ku di Herêma Kurdistanê de hatiye encamdan, berevajiyê destûrê ye, û sîstema parilmanî jî li Îraqê de şikest xweriye. Herwiha wî melayê ser bi rejîma Tehranê di demên derbazbûye de jî gotibû ku: Hekî bi awayekî fermî jî piroseya serbixweyiya Kurdistanê rabigehînin, emê weke navçeyeke dagîrkirî çav lê bikin.

Rejîma Îslamî a Îranê weke serekîtirîn dujminê gelê kurd, bi awayekî hertimî di salên derbazbûyî de hewl daye, da ku ji riya destûpêwendiyên xwe ve, di navbera Îraq û Herêma Kurdistanê de, pirsgirêk û serêşiyan ji bo gelê kurd di vê parçeya Kurdistanê de dirust bike.

Di civîna roja Şemî 30`ê Tebaxa 2017`an, parlmana Kurdistanê "Mes`ûd Barzanî" fermanderê giştî yê hêzên çekdar yên Herêma Kurdistanê serpişk kirin, û ji bo berevanîkirin ji van herêmên ku gef li ser hene.

Koma wan bas û daxwazên kirêgirtî û alîgirên rejîma dijîgelî a Tehranê, nîşana vê yekê ye ku, rejîma Îslamî a Îranê ji pêşeroja nediyar a xwe ditrse, û hemû karekî encam dide, da ku piroseya serbixweyiya Kurdistanê bê armanc be.

# Heliyana cemedê di Rojhilata Navîn de



N: Dr. Îdrîs Ehmedî

Hatina çeka etomî û vegeşiyana demokrasiyê, mecal bo şerê mezin di forma şerê "cîhanî" de nehêlaye.

Paş şerê duyem ê cîhanî rikeberiya di navbera Amerîka û Yekîtiya Soviyetê, bi sedema çeka etomî di forma "şerê sar" de xwe nîşan da. Ew du mezinhêz rasterast berbirûyê yektir nebûn, belkû şerê germ bi wekalet û li ser xaka xelk û welatên din de dikirin.

Vegeşiyana demokrasiyê û qahîmbûna pêwendiya di navbera Amerîka û welatên Ewropî, Japon, Kureya Başûr û Ustiralyayê, "Navçeya Aştiyê" (Zone Paece) lê ket. Demokrasiyê herwisa raya giştî kire faktereke sînordarker, helbet ne rêgir, derheq şerê welatên demokratîk.

Ew yek nahê vê watayê ku sîstema paş şerê duyem ê cîhanî û şerê sar, bêkêşe ye. Serbarê vegeşîna demokrasiyê di Rojava û hinek ji welatên Asyayî, di herêm û cihên din ên cîhanê, serberedayî û dîktatorî tevî komeke nexweşiyên siyasî û nedadperwerî, pêsîra gellek civakan girtiye.

Rojhilata Navîn pişka şêr di domandin û qebûlkirina wan curekêşe û nexweşiyan ber ketiye. Binavkirina Rojhilata Navîn wekî "Dilê Jeopolîtîk" di cîhanê de, rastiyeke haşahilnegir e. Helbet bedela vê ku cihê şanaziyê be, nîşana bedbextiyê ye.

Berevajiyê şerê yekem û duyem ê cîhanî, û encamên wan, encama kêşe û şerên biçûk û nîvemezin ên nêzî du dehikan ên sedsala 21`an, têkder nînin, yan em dikarin bêjin ku bi awayê yekalîker sîstemşikên nînin, belkû ew derkewtane zêdetir hêdî-hêdî sîstemguher û di heman demê de jî sîstemparêz in.

Ew yek jî bûye sedem da ku bûyer ew qas birr nekin heya ku dibin dîrok. Dugmbûneke rêjeyî di navbera sîstemeke lerzok ya cîhanî û pêşerojeke nerohn de xwe dide xûyakirin. Di Rojhilata Navîn de, heya paşveçûnek jî rû daye, şoreşên Buhara Erebî yan bûne xewnemar (kabûs), yan hatine dizîn, yan jî ji hêla hêzên dijîşoreşgeran ve hatin tunekirin. Serbarê du şerên di Kendawê de, tevî hatina "Buhara Erebî" şerê bixwîn li Sûriyê û serhildan û şikesta "DAÎŞ"'ê sîstemeke nû bi van zûkatiya çê nabe. Hekî çê bibe jî, ewê di encama kêşe û rikeberiya di navbera hêzên kevneparêz û sîstemguher de wê çê bibe, ew jî hêdî-hêdî. Di her pêngavekê de ku em davêjin, renge hêzên şoreşger neçar bin ku du pêngavan paşve vegerin.

Tu yek ji hêzên kevneparêz, li serveyî hemiyan Komara Îslamî, ku berjewendiya wan di ragirtina sîstema niha de ye, xwediyê hejmoniyê nînin. Bi watayeke din, tu yek ji hêzên



**Rojhilata Navîn wekî "Dilê Jeopolîtîk" dimîne. Helbet em şahidê heliyana cemedê ne di sîstema nexweş ya navçeyê de**

kevneparêz hêz û şiyana wan ya vê yekê nine, ku xwesteka xwe bi ser navçeyê de bisepînin, tenê dikarin riya guherînkariyê bigrin.

Ji aliyekî din ve Amerîka ku piştî 11`ê Îlonê hewla guherîna sîstemê dida, di siyaseta xwe ya derve de, heman stratejiyê bi rê ve dibe, ku di serdema şerê sar de bi rê ve dibir, ku ew jî ragirtina hevkêşeya hêzê ye. Ragirtina hevkêşeya hêzê alîkarê dugmbûna navçeyê ye di vê rewşa nebaş de.




Referandoma di Başûra Kurdistanê de, di cewhera xwe de kiryareke şoreşgerane bû. Ew yek bi eşkere nîşan dide ku ew sîstema ku piştî şerê yekem ê cîhanî hate avakirin, û piştî şerê duyem ê cîhanî bi jinavbirina Komara Kurdistanê berdewam kar bo cîketina wê hatiye kirin, çavkaniya neseqamgîriya berdewam, û şer û bedbextiyê ye.

Rojhilata Navîn wekî "Dilê Jeopolîtîk" dimîne. Helbet em şahidê heliyana cemedê ne di sîstema nexweş ya navçeyê de. Ew şer û kêşeyên ku îşare bi wan hate kirin, tevî referandoma Başûra Kurdistanê bo serxwebûnê, nîşana berçav ya vê pêvajoyê ne.

»»» Doma nûçeya R: 4

Elî Xamineyî di dawî axavtinên xwe de, li dijî referandoma Kurdistanê, di dema hevdîtina bi Erdoxan re ragehand: "Amerîka û hêzên din ên biyanî ji riya referandomê ve, bona avakirina Îsraîleke din di navçeyê de hewl didin".

Wekî rênîşandan û şîreteke jî bo kirêgirtî û per û baskên xwe yên têker di Îranê de ragehandibû: "Pêwîst e ku rêşûnên taybet û bilez, li dijî veqetiyana Kurdistanê bigrin pêşiya xwe".

Piştî birêveçûna referandomê, hêzên rejîma Îranê û hêzên Îraqî bona birêvebirina manoreke leşkerî ya hevbeş li ser sînorên Kurdistana Rojhilat cihgir bûn, hevdem cuda ji zalkirina rewş û hewayê leşkerî û polîsî bi ser beşa herî zêde ji bajarên Rojhilata kurdistanê gellek çekên giran jî, li bajarên sînorî de cihgir kirin. Rejîma Îranê di rastî de leyîzeke metirsîdar dike, ku ew jî ew e ku bixwe rasterast şer nake, belkû ji riya ekter û lîstikvanên din ên navçeyî armancên xwe dipêke, lê jiber ku qada leyîzê Kurdistan e, bêguman her wekî şirovekar dibêjin, ew nikarin serkevin, û wê rastî şikestê werin.

Piştî gotinên bê serûber ên Xamineyî, pasdarê terorîst Mihemed Husên Baqirî serokê Navenda Giştî ya Hêzên çekdar ên rejîmê basê vê kir ku, hekî pirsa serxwebûnê nehê çareserkirin, wate encama referandomê nehê hiloşandin, navçe wê rastî aloziyan bê.

Pêş axavtina vî pasdarê terorîst Elî Şemxanî serokê Konseya Bilind ya Ewlehiya Neteweyî a Rejîma Îranê jî roja 10`ê Rezbera 1396`an di hevdîtina bi jiniral "Helûsî Akar" serokê Navenda Hevpar a arteşa Tirkiyê re jî, bas ji vê kiribû ku dibe pêşiya bandora referandomê bê girtin.

Nabirî ku referandomê wekî hewleke xweser bi nav dike, û wekî karekî neberpirsane bi nav dike, ragehandiye: "Ew hewla Herêma Kurdistanê dibe sedema têkçûna ewlehiyê di herêmê de".

Ya ku eşkere ye ew e ku referandom şêwaza herî aştîxwazane ye bo diyarîkirina mafê çarenûsê ku tenê dagîrkar û tawankar dijberiya wê dikin, û Komara Îslamî ye ku

»»» Dom R: 9

# Çîroka zarokên bêxwedî di Îranê de



> **Di Îranê de zarokekî bê serperest ku dikeve bindestê zirbavekî, li gora yasayên Îranê ew zirbav dikare destdirêjiyê bike ser wê zarokê, û bo heta-heta laş û ruhê wî bê azardan**

**Şehla Debaxî**

Sê salek dibû ku ez hatibûme Swîdê, û rojekê li binevraza nêzî malê, ez ser diketim, û min destê keça xwe girtibû, û ez diçûme mal. Ji nişkêve zikê min jan kir û ez li ser erdê rûniştim.

Di vê demê de jineke Swîdî ku li rex min re derbaz dibû, pirs kir ku gelo te xêr e? Destê zarokê min girt û em pêkve çûne mal de, piştî vê rojê heya niha, pêwndiya min û "Marî" berdewam dike, lê her çend ku wî çend bajar û welat bo dersxwendinê guherîn.

14 sal berî niha Marî û hevjînê xwe biryar dan ku zarokekê ji Aferîqayê bînin nava jiyana xwe de. Diyare piroseya zarokanînê ji welatên din, gellek bizehmet e û xerceke zaf, nêzî 150 hezar Kironî dixwaze, lê piştî piroseya yasayî "Marî" û mêrê xwe pêkve ji Afrîqayê re keçek û kurek wekî zarokê xwe wergirtin, û niha temenê wan 14 û 12 ye, û wekî her zarokekî din diçin xwendingehê, û jiyaneke baş hene.

Sê salan berî niha Marî got ku keça wan nexweşiya gurçikê heye, û li pey kesekî digerin ku gurçkê xwe bidê, û bavê wê amade ye ku gurçkê xwe bidê, û niha mijûlî ceribandinên pizişkî ne, û piştî ceribandinan derket ku xwîna zarok û bav hev dixwin, û pêwendiya gurçikê bi başî hate encamdan. Diyar e keç heya dawiya jiyana xwe rojane dibe hinek derman bixwe.

**Fakt**

Serbarê dengê dijî rêkxirawên medenî û mafê zarokan, di dawî rojên sala 1392`an terhek di meclisa Îranê de hate pesendkirin(1).

Ew terh piştre ji aliyê şêvra Nobedar ve mohra erêkirinê lê hate dan. Li gora vî terhî kesên ku zarokekî wekî ê xwe serperestî dikin, dikarin li gora yasa û şer`i vî zarokî wekî hevjînê xwe hilbijêrin û pê re bizewicin.

Tirsa çalakên mafê zarokan ji pesendkirina vî terhî ew bû ku heya di "dewrana Hizanetê" de jî renge ew îzna yasyaî ku dane zirbavan, ji aliyê piraniya wan ve bê cîbicîkirin.

**Cudahiya di navbera du dîtingehan**

Ez bi tu awayî naxwazim bêjim ku di welatê Swîdê de tu cure kêşe û destdirêjiyek tune ye. Li gora Rêkxirawa "Rizgarkirina Zarokan" di Swîdê de, di navbera %3-5 ji zarokan ji aliyê kesên herî nêzîk ve rastî destdirêjiyê tên. Tawan û binpêkirina keramet û mafê zarokan di hemû cihekî cîhanê de tê xûyakirin. Lê eva ku berçav e, cudahiya di navbera yasayên welatekî wekî Swîd û yasayên nemirovî ê Komara Îslamî ye, bo parastina zarokên bin 18 saliyê de, û piraniya caran keçan.

Di kultura welatekî wekî Swîdê de, mirov naçe Afrîqayê zarokekî/ê bîne ku piştre pê re bizewice, lê li gora yasayên Komara Îslamî îzin tê dan ku bi nav "bav" digel zarokên xwe ku di bin temenê yasayî de ne bizewicin.

Di Îranê de zarokekî bê serperest ku dikeve bindestê zirbavekî, li gora yasayên Îranê ew zirbav dikare destdirêjiyê bike ser wê zarokê, û bo heta-heta laş û ruhê wî bê azardan.

Ecêb ew e ku alîgirên wê yasayê wek "başitî û qenciya" derheq zarokên bêserperest dibînin, û dibêjin jiber ku di şer`i di ew kar nerewa û ne şer`î nahê dîtin, û ew zarok yê te bixwe nîne, ku wisa bû, ew reftara dijî deb û resmên civakê dikare yasyaî be.

**Berencam**

Di civakeke mirovî wekî Swîdê de, ne tenê yasayên ne nivîskî û kultura wê ya mirovî biryarê didin,belkû mafên însanî û pêwendiyên mirovî, ji riya yasayî ve jî têne dabînkirin. Di civakek mirovî de, kesên wekî "Marî" du zarokan ji Afrîqayê ve tînin, bona vê ku jiyaneke mirovî pê bibexşin, û hezkirinê nîşanî wan bidin, û hevjînê "Marî" gurçikeke xwe dide keçikê, da ku di jiyanê de berdewam be. Di civaka mirovî ya Îranê de, zarok alavekî cinsî ye, bo hesta zayendî ya nexweş ya beşek ji mêran, ku li gora yasa û şer`i hemû hêsankariyek bo wan tê kirin. Di civaka ne mirovî ya Îranê de bi hezaran zarokî seba hejariyê têne firotin, û gurçikên wan derdixin.

---

»»» Doma R: 8

bi eşkere û bi ew qasê bêşermî ve li dijî rapirsiya neteweyekê, gefan dixwe, û li dijî wê disekine, ew yek jî nîşanderê nefret û bêzariya rejîma zalim ya Tehranê li dijî Kurd û pêkhatina dewleta Kurdî ye.

Hewcehî îşarepêkirinê ye ku di roja birêveçûna referandomê de, û piştevaniya eşkere ya PDKÎ ji vê pirsa çarenûssaz a neteweyî, gelê Kurd di Rojhilata kurdistanê de, wekî xûşk û birayên xwe di Başûr de, kolan û rê kirin qada cejn û kêfxweşiya xwe, û bi rabûna xwe ya bicoş gund û bajarên Rojhilata Kurdistanê ji Ciwanro ve heya Mehbadê, kirin qada govend û dîlanê, û dawî bizmar li sindirûka faşîzma qewmî û totalîtarîzma zal di nava Îranê de dan.

# Di wijdana nivîskar û helbestvanan de serxwebûn



**Serxwebûn û dewletbûna Kurdistanê raman û xeyala herî diyar û balkêş e ku hêlîna xwe di dilê her Kurdekî de çêkiriye, nexasim di dil û wijdanê piraniya nivîskar û helbestvanên Kurd yên her çar parçeyên Kurdistanê de.**

Bi taybetî helbestvanên Rojavayê Kurdistanê girîngiyeke pir mezin dane mijara serxwebûna Kurdistanê û dirustbûna dewleta kurdî û bi dilekî tijî hezkirina welat û rizgariyê li benda roja serxwebûnê mane.

Helbestvanên Kurd yên Rojavayê Kurdistanê di dîwan û berhemên xwe yên giranbuha de, cihekî pir mezin û taybet dane mijara serxwebûn û rizgariya Kurdistanê.

Helbestvanê Binxetê yê mezin û navdar Mele Nûriyê Hesarî ku di sala 1934an de hatiye ser rûyê dinyayê, hemû jiyana xwe di xewn û hêviya dîtina dewleta kurdî û derketina Kurdan ji bin destê dagîrker û neyaran buhurand.

Mele Nûrî ku di sala 2011an de ji dinyaya fanî bar kir û wek Seydatê Pirêşan jî tê binavkirin, dixwest berî mirina bêmefer çavên xwe bi ala kurdî ya rengîn û dewleta kurdî ya serbixwe bixemilîne. Pirêşan di helbesta xwe ya bi navê Berî Mirinê de wiha dibêje:

Xwezya berî ez bimrim peyda kirba min derman
Ew bû kû min bidîta bûye dewlet Kurdistan
Leşker çêkin bezrînê li Berzan û li Batman
Xuyabî ala rengîn li ber derya Loristan
Zînim tînim dibînim ber çavê xwe Kurdistan
Dîn û bê hiş dimînim ji av û bax û bustan
Bêjim sirûdê Kurda dilxweş çêkim Nûrozê
Aza bibî Kurdistan ruha bin em ji dozê
Zaro herin dibistan mîna berxê di kozê
Bikin seyran û geştê li wan çolan wek mozê

Mihemed Elî Heso jî yek ji helbestvanên klasîk yên Binxetê ye. Heso ku wek Nûjen jî dihat naskirin û di sala 1930î de ji dayik bû, helbestvanekî neteweyî yê dildarê serxwebûn û azadiya Kurdistanê bû. Nûjen di sala 2016an de xatirê xwe ji dinyayê xwest û pê re negihîşt Roja Serxwebûnê bibîne. Di sala 1993an de, Mihemed Elî Heso helbestek bi navê Roja Serxwebûn nivîsand û tê de wiha dibêje:

Ji bo te rojê divê gelek kar
Ku em te derxin ji destê neyar
Tu têbîra me di xewnê şevan
Di êrîşa de di nava ewcan
Mane gelê Kurd salên dûrdirêj
Jibo te dikir rojî û nimêj
Ew geh bi xweşî, geh bi kîn û gef
Ji lewra dijmin me berdide
hev. Tev ji bo te ye roja serxwebûn
Rengê te çi ye tu çi lewn û gûn
Ji bo te dikim ezjî vî karî
Da zû derkevim ji şeva tarî
Rêça bi rûmet rêça serxwebûn
Gernasên hêja divê rê de çûn

**çavkanî: Malpera Rudaw**

# Zimanê Kurdî

## Li dikana qesabiyê

**Gewrê û Zînê çûne sûkê ku pêdiviyên rojane bikirin. Ew cîranên hev in. Carcaran bi hev re diçin sûkê û kiriyariyê dikin, digerin, bi hev re tiştekî vedixwin û vedigerin malê.**

**Gewrê: Em destpêkê biçin kîjan dikanê gelo?**
**Zînê: Em goşt bikirin û wilo derbas bibin.**
**Goştfiroş: Hûn bi xêrê hatin Sitiyên delal. Ez çi bidim we?**
**Gewrê: Goştê te teze ye?**
**Goştfiroş: Hîn hilm ji ser difûre. Vêzbê hat serjêkirin. Goştê berxê salê ye.**
**Zînê: Xweş xuya dike. Tu kîloyekê ji min re li mekîneyê bide, hûrhûr bike û kîloyekê jî ji bo nava tirşikê bila tevî hestiyan be, lê wê jî ji kerema xwe re tenê hûr bike.**
**Goştfiroş: Ser çavên min. Hûn çi dixwazin?**
**Gewrê: Yê min wê mêvan werin. Kîloyek têra min nake. Tu rehnekî sax biwezinîne û pişt re ji kerema xwe re hûr bike. Ez ê hûrhûrkirî ji goştê berxan naxwazim. Goştê golikê heye li cem te?**
**Goştfiroş: Erê, heye. Tu dixwazî ez ji goştê golikê yê hûrhûrkirî bidim te?**
**Gewrê: Belê Kîloûnîvekê jî ji wî goştî bide. Lê belê bila bez ne tê de be, tenê goştê sor be.**
**Goştfiroş: Ser serê min û ser çavên min. Aniha ezê amade bikim.**
**Peyvên tu nizanî li jêrê binivîse:**

**Van pirsan ji hevalê xwe/ji hevala xwe bipirse û bersivan li vê derê binivîse:**

**Tu ji goştê berxikan hez dikî?**

................................................................................................
................................................................................

**Tu goştê golikan dixwî?**

............................................................................................
.......................................................................................

**Tu dizanî xwarinên bi goşt çêbikî?**

................................................................................................
................................................................................

**Li dikana qesabiyê divê goşt çawa were parastin?**

................................................................................................
................................................................................

**Li ser paqijiyê gotûbêjekê li pêş bixin.**

................................................................................................

## Tiştonek



A: Mahir Berwarî

- Sih kes di gemiyekê da bûn, di niva deryayê da diçûn. Ji wana 15 Mosilman bûn yên dî Bitperist bûn. Gemî kun dibit, çare divêt 15 kes jê dakevin da gemî niqum nebit. Wesa rêk keftin ku xwe rêz ken û her carê heşt kesa bijmêrin yê nehê derxînin. Wisa hatine rêz kirin ku her 15 Bitperist havêtine avê û her 15 Mosilman a xwe rizgarkirin û bi silametî gihan rexê avê. Erê vana çawa xwe qurtalkirin?
Bersiv: (* X=Mosilman, += Bitperist Rêzkirna wan bi vî rengî bû.
XXXX +++++ XX + XXX + X ++ XX +++ X ++ XX +)

- Sê kes bi pirê da çûn. Êkî pir dit û pê li pirê na û bûrî, ya dî pir dît û pê li pirê ne na û bûrî, ya sê ne pir dît, ne pê lêna û bûrî. Ev çawa çê dibe?
Bersiv: (* Jineke zarokel li milî ye û êk di zikî da ye.)
- Ji keçekê pirsîn: Diya te kîve çûye? Wê bersiv da: Ya çûy dostî bikete dojmin, êkî bikete du, dê hêteve du ya dê kete êk.
Bersiv: (* çûbû ji dostekî qera bikit, pîrkiyê bû jineka bi hal bikit, dema vegerê wê lihêfeka du tûx/qat çêkit.)

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (311)


## Çalakên Kurdistana Îranê: Bersiva şahî û kêfxweşiya xelkê nabe girtin be

**Hejmarek ji çalakên Kurdistana Îranê, bi rêkxistina kempeynekê di torên civakî de, daxwaza berdana hevwelatiyên destbiserkirî ên beşdarbûyî di civînên piştevaniya ji referandoma serxwebûna Kurdistanê de kirin.**

Li gora nûçeya ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya Kurdpayê, çalakên Kurdistana Îranê, ji riya rêkxistina kempeynekê daxwaza azadkirina girtiyên beşdarbûyî di civînên piştevaniya ji referandoma serxwebûna Kurdistanê de kirin.

Wan çalakan ragehandine ku bersiva kêfxweşiya xelkê nabe girtin be, û dibe ew bêne berdan.

Piştî birêveçûna referandoma Kurdistana Başûr bi awayekî serkevtî, hevwelatiyên Kurdistana Îranê jî rijiyane ser kolanan, û bi kêfxweşiyê piştgiriya xwe ji Kurdên Başûra Kurdistanê re nîşan dan.

Lê hêzên Îtila`atî ên rejîma Îranê hejmareke zêde ji xelkê beşdar di kêfxweşiyê de, destbiser kirin, ku heya niha jî çarenûsa wan nexûya ye.

Piştevaniya ji giştpirsiyê ji aliyê Kurdên kurdistana Îranê ve, dijkiryara tund ya hêzên Îtila`atî li pey xwe hebû. Malbatên girtiyan ji çarenûsa zarokên xwe bêxeber in, û Îtila`at zanyariyên rast derheq cihê ragirtina zarokên wan nade wan.




## Bi teqeya hêzên Întizamî yên Îranê, kolberek birîndar bû



**Hêzên Întizamî yên Hikûmeta Îranê, di bajarê Serdeştê de teqe li kolberekî kurd kirin, û di encamê de jî, ev kolberê kurd bi dijvarî birîndar bû.**

Li gora nûçeya gihîştî Ajansa Nûçegîhaniya Kurdpayê, roja Şemî 9`ê Cotmeha 2017`an kolberekî kurd yê xelkê yek ji gundên bajarê Serdeştê bi teqeya hêzên Întizamî yên Hikûmeta Îranê hate birîndarkirin.

Nûçegihanê Kurdpayê, nasnameya wî kolberî kurd “Siyamend Rastgû” kurê “Luqman” û xelkê gundê “Mîrava” a ser bi bajarê Serdeştê daye zanîn.

Hêzên Întizamî di cihê bi navê “Weznê” ev kolberê kurd dane ber gulleyan, û di encamê de jî navbirî bi dijvarî birîndar bûye.

Herwiha “Siyamend Rastgû” ji bo çareseriya xwe ji bo yek ji nexweşxaneyên bajarê Urmiyê hatiye veguhastin û heyanî vê demê jî li jêr çavdêriya pizişkî de ye.

Karnas û mafperweran dîtingeha wan wiha ye ku, li gora yasaya bikaranîna çekê, teqekirin li kolberan, binpêkirina yasayê bixwe ye.

Li gora amarên tomarkirî yên di navenda amara Ajansa Nûçegîhaniya Kurdpayê, di meha Çileya Paşîn heyanî meha Tebaxê, di heyama 8 mehên sala 2017`an de, bi teqeya hêzên hikûmetî , teqîna Mayînan, Renî, sir û seqem, berbûn ji bilindahiyan, êrîşên hêzên Întizamî , kuştin û birîndarbûna kolberan di riya hatûçûnê de, 149 kolber birîndar û jiyana xwe ji dest dane.

## Tawanbarekî gendel bû birêveberê Navenda “Iqtisadê Muqawimetî”



**Serokê Navenda Fermandehiya “Iqtisadê Muqawimetî (aboriya xweragirane), di biryarekê de Hemîd Pûrmihemedî kire birêveberê vê navendê.**

Li gora zanyariyan, Hemîd Pûrmihemedî ku hevdem

cihgirê Mihemed Baqir Nûbext di Saziya Bername û Bûdceyê de ye, yek ji tawanbarên dosiyeya destpîsiya bankî ya sê hezar milyard Tûmenî bûye, heyamekê di girtîgehê de bû, lê bi danîna wesîqeya 500 milyûn Tûmenî hate berdan.

Navbirî ku çendîn berpirsayteiyên girîng di beşên malî de hebûne, di serdema serkomariya Ehmedînijad de jî, karîbû biraziyê xwe bi navê Ferhad Himetî bi bawernameya tezwîr (saxte) bike birêveberê Sindûqa Hevbeş ya Îran û Vênzoêlayê, û bike endamê heyeta birêveberiya banka navnetewyeî ya vegeşandinê, ku ser bi banka vegeşandina şandina kalayan

(sadirat) di Vênzoêlayê de ye.

Karbidestên herî payebilind ên rejîmê ku berdewam bas ji dadperweriyê û xebata li dijî destpîsiya malî û diziyê dikin, bixwe kesên herî gendel in, û piraniya wan bi diziya serwet û samana welat bûne milyarder. Ew yek di demekê de ye, ku her li gora amarên rejîmê bixwe, %11 ji xelkê Îranê di bin xeta hejariya tewaw de ne. Xeta hejariya tewaw, wate wan kesan heya hêz û şiyana kirîna hewcehiyên herî destpêkî û bingehîn ên jiynê jî nînin, û tewaw desteng in.